UNIPERIFERIAS

NAME JI MARÉ, RIO DE JANEIRO -
MANÎFESTOYEK JI KENARAN

KENARAN Û CIHÊ WAN DI BAJARÊ DE

INSTITUTO
MARIA E JOÃO
ALEIXO

Di Adarê 2017’ an de, Şebekeyê Navnetewî yê Kenaran seminara xwe a yekem li Maré, Rio de Janeiro li dar xist. Armanca sereke ya vî seminarî ji bo ku di nav rexistin, tevger, kom û kesayetan ku li cihên xwe ên seranserî cîhanê hemdem tevlî çalakî dibin de helwesteke hevgirtî ava bike.

Ev xebata avakirin ne xebatekî biçuk e. Di rastî de, weke tê zanîn, em di cîhanê civakî ku bi nunertîyên şaş hat serwer kirin de jiyan dikin. Van nûnerîyan avakirina fêmkirinên rastiyên kenaran ên civakî, aborî, siyasî û ekolojîk asteng dikin. Ji ber ku tiştên aşopî bibin bingeha rastî, nûnerîyan kenaran ên qalibgirî, ên ku komên civakî ên herî feqîr jiyan dikin, siyasetên gelemperî û şexsî bandor dikin. Van nûneriyan pêwîstîyên wan kesan ... . Ya din jî, van nûneriyan terxandina madî û sembolîk xurt dikin, û ew stratejiyên hevpar ku komên kenaran avakirin, lewaz dikin.

Daxkirina civakî hem li welatên sereke, hem li welatên olamgirtî di astên civakî-aborî û siyasî ên hemdem de pêk were. Pêşbînî pir caran li ser bingehekî civakî hat çekirin, û lêhûrbûna kenaran bi piranî li ser bingeha modelên giredayî teorîyên bajarî û pêşbînîyên çandi/estetîk ku komên civakî ên serwer çekirin, e. Van koman, li gorî modelê “şaristanî” yê niha,...
Ew jî têgeha rêzbûn û cureyên guncav ên reftara civakî penasê dike.
Ya din jî, pêşketina fikirê ku xayîbî, kêmahî, û homojenî weke beşên perspektîvên kêmkirinî û penasêkirinên desthilatdarî dibînin heye. Ev fikir cudahî di navber kenaran û modelê bajar yê utopîk li ser esasîya modelên metingehî ên çandî û perwerdeyî dupat dike. Ji vê perspektivê, kenaran weke cihên dilodîn tê dîtin, û dîroka şênîyên wan tê red kirin, axê wan weke qedexe tê dîtin, û şênîyên wan weke hewesî bê şaristan tê dîtin.

Lê belê, kenaran bi saziyên civakî re giredayî, bi taybet bi dewlet û bazarê resmî re. Di vî tekilî ya bi nakok de, kenaran pir caran weke model ku ser xeta dewlet û bazar nameşin. Wextê ku wan kenaran tenê bi van saziyan civakî tên temsîl kirin, tenê bi perspektîfên kotîtî û bi alozî tê dîtin, û nasname, jîrîtî, û zanyarîya dewlemend ên wan kenaran nayê dîtin.
Ew ku piştgirîya xwe didin ev name, perspektîfên kêmkirinî, qalibigirî û reşkirinî qebûl nakin. Kenaran pir şêwazên civakî, aborî, û candî cem wan hene ku penasêya wan ya hesan asteng bike. Her wiha, şebekeyên fireh ên femkirin lazim e. Em dizanin ku kenaran li seranserî cîhanê ne hemû eynî ne, di nav wan de çend taybetmendîyên hevpar hene. Em dibêjin ku her kenar beşeke girîng e bajar. Kenar ji bo bajar bingehîn e, û nasname, wate, û mirovahî dide bajar.

Divê ku penasêya kenar tenê bi dûrahîya ji navenda hegemonîk girenade, û tenê bi dînamîkên civakî-aborî girenade. Divê ku kenar bi rêbazên rojane ku mozaîka civakî ya bajar çedikin tê naskirin. Giredayî van rêbazan potansiyela afirdanin, cureyên cuda cuda ên hebûn, û rêzkirinên dijî-hegemonî ku ji bo her kenarek taybet e.

Ji rûnermî, ji naskirina rêbazên şênîyên kenar, û şert û mercên objektîf ên jiyana civakî a wan, divê ku standarteke malên guncav tê penasê kirin. Ev tişt ji derfetên herî hêsan ên jiyanî dest pê dike. Ev pêvajo cihê çedike ku kom dikarin bi riya nirx, rêbaz, tecrube, bîranî û cihên xwe di nav civakê de bihevre nasnameya xwe daxuyanî bikin.

Ew ku piştgiriya xwe dide ev name, kenaran weke heremên bajarî dibînin; herem ku van astengiyan jiyan dikin:

- Beşdarbûna karkeran bi karê bazarê jêrîn
- Rêjeyên bilind ên bêkarî û karê neresmî, taybet ji bo kesên ciwan
- Hejmarên mezin ên komên bindest - reşik, çermsor, penaber û koçber, qereçî, kêmjimarên etnîk û olî, û gelên bindest ên din - ew ku dixwaze rêbaz û nasnameyên xwe ên çandî berdewam bike.
- Pir dijwarî di cihên gelemperî de - hem ji ber encamê şerê dewlet yê "Şer li hemberi muxederat" , hem ji rêbazên xwînrêj ên hêzên asayîşa dewlet û komên çete.
- Newekhevîya jin û mêr, ku encam dibe tund li ser jinan di jiyana wan ya rojane de û tund di nav malbatê de.
- Xwarina mafê mirovan û nefret li hemberî komên LGBT, bi taybet komên trans, ku rêjeya gelekî bilind a kuştin çedike
- Tundîya giran li ser kesên ciwan, ku taybet li ser kêmjimarên nijadî û etnikî hat meşandin
- Kêmahîyên perwerdeyî, ku ji normal xirabtir e
- Cihên ku ekolojîyên wan bi destê rexistinên gelemperî û şexsî hat xirab kirin

Em jî dibêjin ku potansiyelên kenaran pir in:

- Hebûna nifûsê ciwan yê aferîner ku dikare daxwaza xwe a mafê xwe bide
- Cirantî û hezkirineke xurt, û hezkirinek ji bo jiyanên hevpar
- Pir çand, hûner, u şano ku dikare serpehatîyên bajarî ji nû ve biafirînin
- Hebûna piştgirî û insîyatîfên aborî
- Hebûna xizmetên alternatîf ên bajarî, perwerdeyî, aborî, û milkî, weke bertekeke ji kêmasîyên dewletê re
- Xwereveberiya cihên gelemperî bi şênîyên wan ku tecrube or xweseriya xwe temsîl dike
- Çareseriyên afirîndar ji bo mal, xizmetên civakî, û avahîyên komî
- Rêbazên cihêreng û pirçand ji ber tecrubeya jiyana hevpar di nav gelek netew, etnîsîte, û olên cuda cuda de - lê di heman demê de rewşên nakokî û nijadperestî nas dike
- Cihên aferîner û zanyar, ku divê ku bi civak re tê naskirin
- Hebûna komîn, tevger, u rexistinên civakî ku ji bo mafê xwe tekoşîn dikin û daxwaz û çalakiyên xwe berfireh dikin û dimokrasîbûna bajar dikin armanc.

Ji bo ku pirrengê bajar tê femkirin, divê ku taybetmendiyên her heremek tê naskirin û hemû şênîyên wan jî tê naskirin. Ji bo vê yekê divê hemû şênîyên kenaran weke komeke tiwana ku dikarin serpehatîya çand û çivakê wan reveber bikin. Divê ku ewê sembolên xwe yên berxwedan û afirandin weke şêwazên şenber tê naskirin, û divê ku mafê wan bi siyaset tê misoger kirin. Ev tişt bibe rêbazekî naskirina jiyana civakî û dimokratîk. Ji bo misogerkirina vê rebazê avakirina tecrubeya radîkal û dimokratîk lazim e.